Bidestveanîna mafên neteweyî yên gelê Kurd di çarçoveya Îranek Demokratîk û Federalî de

Hejmar: 50
31'ê Oktober
Buha: 150 Tûmen

agiri

Sê Rojnamevanên Heftînameya Rojhelatê Bê Ser û Şûn În

Nêzîk 3 hetfiyan dibe ku sê rojnamevanên Heftînameya Rojhelatê li Sinê hatine girtin û heya niha çarenivîsa wan ne xuya ye....

Rojhelat

R. 6

Rojnameya panzdehrojî ya siyasî, çandî û gişti

Partiya Demokrat ya Kurdistana Îranê diweşîne

Divêt Gel Hilbijartinên Şêwran Baykot Bikin

Mijarek Li Ser Şêwrên Îslamî yên Gund Û Bajaran



R. 3

Tu Bêjî Agirbesta Vê Carê Ya PKK'ê Aştî Lê Bikeve?

R. 4

Duyemîn Kongireya Partiyên Kesk Yên Ewropayê û Derkirina Daxuyaniyekê Li Ser Îran Û Kurdistanê

R. 5

Daxuyaniya Çapemeniyê
PDK Îranê pêwîst bi veşartina tu "peymanek"ê ji xelkê Kurdistana Îranê nabîne

R. 8

Kurd Û Mafê Mirovan Di Komara Îslamî De

R. 8

Rî Jî Dêndar Dibin

R. 9

Azadiya Mirov

R. 10

Polîtbîroya PDK Îranê di derbarê hilbijartinên Şêwrên Îslamî ên Gund û Bajaran û Meclîsa Xibregan ku qirar e di dawiya payîza îsal de birêvebirina, biryar girt û ji neteweyên Îranê bi giştî û nemaze neteweya Kurd daxwaz kir ku van hilbijartinan baykot bikin. Hilbijartin di sîstema Komara Îslamî ya Îranê de bi tevahî ne demokratîk in û neteweya Kurd di çend hilbijartinên çûyî de bi awayekî berfireh sindoqên dengdanê baykot kirin.

Deqa daxuyaniya girîng ya Polîtbîroya PDK Îranê di rûpela 2 ya vê hejmara Agirî (50) de

Manora Leşkerî Ya Amerîka Û 24 Welatan Li Kendawa Fars De Bo Pêşgîrî Ji Xurtbûna Çekên Navikî

Rayedarên Wezareta Derve ya Amerîkayê dan xuyakirin ku roja duşem û sêşemiyê 30-31.10.2006'an dê rêveberiya manoreke deryayî bi hevkariya 24 welatên din li "Xelîc Fars"ê de bikin. Ev manore dê bi merema "Xebat dijî zêdebûna Çekên Navikî" bi pişikdariya welatên derdora "Xelîca Fars" û li nêzîk Îranê de birêve diçe.

Keştiyên 6 welatên Amerîka, Firansa, Îtalya, Avustraliya, Birîtaniya û Behreynê dê bi merema hilkolîna van gemiyên ku bi awayeke neyasayî madeyên çek û teqemeniyan(PSI) bar dikin, têde pişikdar bin. Behreyn mêvandariya vê manor (tetbîqat)ê dike û eva cara yekemîn e ku çend welatên Kendava Fars weke Behreyn, Qeter, Kuweyt û Mîrîtiyên Erebî yên hevgirtî di manoreke han de pişikdariyê dikin.

Hêjayî gotinê ye ku manora han di demekê de tê meşandin ku welatên bihêz yên cîhanê mijûlê nirxandin û gotûbêjan li ser biryarnameyekê di Konseya Ewlekariyê de ne li dor baykot û hisara aborî li ser Îranê bi sedema nesekinandina xebatên xwe yên mehandina Uraniyûmê.

Çavkanî : "VOA news.com"

Arjentînê Biryara Dadgehîkirina Refsencanî Da

Dozgeriya Arjentînê, Îran û Hizbulah ji ber teqandina Navenda Komeleya Cihûyan ya "AMIA" di sala 1994'an de tewanbar kir. Ev kiryara terorîstî ku di sala 1994'an de li "Buenos Aires" a Paytexta Arjentînê de rû dabû, 85 kes hatibûne kuştin. Di civîneke çapemeniyê de, bi awayekî fermî ji aliyê dozgeriya Arjentînê ve hate ragihandin ku wan biryara girtina Serok Komarê Îranê yê berê Elîekber Haşimî Refsencanî daye.

Îranê berî niha daxuyanî dabû û diyar kiribû ku pêwendiya wê bi teqînê re tune ye.

Serdozgerê federal yê Arjentînê, "Alberto Nisman" ji çapemeniyê re got, piştî lêkolînê em gihiştine wê encamê ku biryara teqandinê ji aliyê Îranê ve hatiye dayîn.

www.rojhelat.org

Daxuyaniya Deftera Siyasî Derheq Bi Nav Hilbijartinên Şêwrên Gund û Bajaran Û Meclîsa Xîbregan

Hevwelatiyên hêja!
Xelkê qehreman yê Kurdistanê!

Li gor wan nûçeyên ku heya niha belav bûne, rejîma Komara Îslamî dixwaze hetanî nîva duyem ya meha Sermaweza îsal (dawiya Payîzê), şanoya hilbijartinên Gund û Bajaran dubare bike û careke din û bi taybet di rewşa niha ya hundir û derveyî de bi awayekî rûyekî diyardeyeke demokratîk weke hilbijartinê rêve bibe û hevdem nûnerên Meclîsa "Xîbreganê"ê destnîşan bike.

Komara Îslamî ya Îranê di rewşekê de ku li hundirê welat bi sedema nebûnî, bêkarî û betaliyê û binpêkirina maf û azadiyên xelkê tevî nerazîbûneke xuya û berfireh berbirû ye û li derve jî seba maytêkirin û destêwerdan di nava kar û barên hundir yê welatan, piştgirîkirin ji girûpên terorîstî û komikên tundrew û hewl û bizav ji bo bidestxistina Çekên Etomî di bin zext û givaşa raya giştî û welatên bihêz de ye, dixwaze şanoyeke din di bin navê hilbijartinên Şêwrên Gund û Bajaran de lidar bixe û bi her awayekê pê çê be, xelkê bo ser sindoqên dengdanê rakêşe û wisan nîşan bide ku serbarê vê rewşa ku tê ketiye, niha jî xelk alîgir û piştevanê rejîmê ne û bi beşdarîkirin di hilbijartinan de ji aliyekê sozdayina xwe ji bo rejîmê dubare dikin û ji aliyê din ve jî li rêya van cure hilbijartinan, parek ji kar û barên xwe bidestve digirin û vê şanoyê bixe ber çavê raya giştî û xwe pê mezin bike.

Ji tu kesê re ne veşartî ye ku di dirêjahiya temenê Komara Îslamî û pêka kakil û naveroka kevneperestane û dijî demokratîk ya vê rejîmê, hilbijartin di şeklê rastîn û demokratîk yê xwe de birêve neçûne û encameke dilxwaz ji bo xelkê lê neketiye. Ji ber ku ve rejîme bi xwe li ser bingeheke demokratîk nehatiye avakirin û bawerî bi hilbijartinan ne bi wateya xwe ya rastîn heye. Ev rastiye ne tenê di asta hilbijartinên Şêwrên Gund û Bajaran de, belkî di hilbijartinên girîng û bibandortir de jî bi tevahî yê derketiye holê.

Di Komara Îslamî ya Îranê de pêkhateya desthilatê li ser bingeha "Welayeta Feqîh" û biryara takekesî hatiye avakirin ku di rejîmeke bi vî awayî de xelk ji bilî vê çendê ku fermanan birêve dibe û di xizmeta desthilatê de ye, tu delîve û derfetek din jê re nemaye, heya bikarin di çarçoveya her çiqas tesk û berteng de jî be, li ser qeder û çarenivîsa xwe biryarê bidin û parek ji kar û barên xwe bidestve bigirin.

Ceribandina du ger ji hilbijartinên berê yên Şêwrên gund û bajaran yê daye kifşê ku ev cure Şêwrene ne bi awayê qanûnî xwediyê maf û desthilateke wisan in ku bikarin di xizmeta xelkê gund û bajaran de bibin û ne bi kiryar û piratîk jî rê ji wan re tê dayîn ku di vêc û berjewendiya gel û karê avedankirina gund û bajaran gavan bavêjin, lewra jî di hinek gund û bajaran de jî kesên xweşnav û xweştevî yên xelkê jî bi kêmî rêya wan ketibe nava wan şêwr û civatane, bi kiryar ji wan re xuya bûye ku di bin desthilat û zext û givaş û zêrevaniya xurt ya rayedarên herêmî yên vê rejîmê nikarin ji bo xelkê bibin sedem û çavkaniya tu xêr û xizmetekê.

Heke hetanî niha Şêwrên Îslamî yên han hatine neçarkirin ku bêtir di xizmeta rejîmê de bin û ji bo pêşvebirina armanc û bernameyên dijî gelî ên rejîmê li herêmê û bajarên cur bi cur ên welat de kar û xizmetê bikin, heke heya niha Şêwrên Gund û Bajaran derfeta kêmtir ji bo bîr û fikirkirin ji xelkê û gav avêtin di rêya berjewendiyên xelkê de hebûye, di pêşerojê de û nemaze tevî bi destvegirtina desthilatê ji aliyê Mehmûd Ehmedînejad û kabîneya wî ya leşkerî û polîsî, desthilata Şêwran ji ya heyî kêmtir û felsefeya hebûna wan jî kêmrengtir û bêmifahtir ji bo xelkê, lê bibandortir ji bo rejîmê dibe. Her di vê der barê de çavnihêrî tê kirin ku pêvajoya li bêîngdana berbijaran û ret û betalkirina kêrhatîbûna ew kesên ku heya radeyekê hez dikin xizmetê bi xelkê û gund û bajaran bikin, xurtir û bêtir be û destnîşankirin û serxistina mohreyan ji sindoqên dengdanê û kirêgirtiyên rejîmê bi merema hevahengkirina Şêwran ku tevî siyasetên rejîmê xuyatir be û aqibet ev bi nav Şêwrane ku divêt di xizmeta xelkê de bin, bi kiryar di xizmeta rejîmê û li hemberî gel de tên ragirtin û zêdetir ji berê jî weke aleva pêşdebirina bername û komployên rejîmê li gund û bajaran tên bikaranîn. Di encama vê rewşê de gelek ji siyasetên dijî gelî û xwe parastina rejîmê ji ne encamdana kar û barên xizmetkirinê bi xelkê li stûyê van Şêwrane tê avêtin û kêmasiyên rejîmê pê serpûş dikin û diveşêrin.

Lewra ye ku divêt eva bihê berçavgirtin ku heke Şêwrên Gund û Bajaran li berê bêdesthilat bûn û bi kiryar rê ji wan nehatiye dan heya di çarçoveya tesk û teng ya êxtiyarên xwe de karekî wisan ji bo xelkê û gund û bajaran bikin, vê carê bi kiryar û piratîk dê kosp û astengên bêtir di xizmetkirina wan bi xelkê çê bibe û dê pitir bihên neçarkirin ku xwe tevî siyasetên rejîmê û xizmetkirin bi Komara Îslamî rê bixin. Lewra beşdarîkirin di hilbijartineke wiha de çi ji bo xwe berbijarkirinê û çi bo amadebûn li ser sindoqên dengdanê, dikare çi xêrek û çi xweşnavî û bandorek ji bo berendam û dengderan lê bikeve?

Serbarê vê yekê ku van bi nav hilbijartinane tu encameke baş ji bo xelkê lê nakeve, rejîm hewl û bizavê dide ji çend aliyan ve mifaha xwe jê bistîne:

Yekem: Dixwaze bi rakişandina xelkê bi awayekî berfireh bo ser sindoqên dengdanê, rûçikek wisan ji xwe bixe ber çavê raya giştî ku tu bêjî xelk bi dileke germ û hêviyeke mezin pişikdariyê di van hilbijartinane de dikin û rejîm ji vê pirsê wekî hebûna piştevaniya xelkê ji xwe û berheqî û meşrûiyeta sîstema xwe mifahê jê distîne.

Duyem: Bi bername û ji bo cihgirkirina mohre û kirêgirtiyên xwe di nava Şêwran de dê karekê bike ku siyaset û komployên dijî gelî ên xwe ji rêya van Şêwran encam bide, bednaviyê ji bo Şêwran pêk bîne û eyb, kêmasî û buxtanê li ser îdare û dezgehên xwe rabike.

Sêyem: Her li kêleka van bi nav hilbijartinên Şêwrên Gund û Bajaran de, rejîm bi nav hilbijartina nûnerên Meclîsa "Xibregan"ê jî

encam dide. Ev hevçaxiye bêtir ji ber vê çendê ye ku rejîm dizane heke bi cuda hilbijartinê ji bo Meclîsa "Xîbregan"ê ku erk û wezîfeya diyarîkirina "Welî Feqîh" û çavdêrî û kontrolkirina bi ser karên wî de li stû de ye, her bi emr û raspardeyên "Weliyê Feqîh" tên diyarîkirin û di hemen demê de jî tu pêwendiyek bi parek berçav ya welatiyan nine ku baweriya wan bi hebûna "Weliyê Feqîh" tune ye.

Demekê ku ev rastiyane berçav dikevin û mirov dêna xwe dide derbasbûyiya van cure Şêwr û civatane û armanc û miramên rejîmê ji meşandina van terze hilbijartinane tê şîrovekirin, me tîne ser vê baweriyê ku beşdarîkirin di hilbijartinên Şêwrên Gund û Bajaran ji bilî alîkarîkirin bi rejîmê ji bo serxistina komplo û pîlanên rûyekî û xapandina bîr û raya giştî ya cîhanê, encameke din lê nakeve. Berevajî vê yekê jî, xwe parastin û beşdarînekirin di van hilbijartinane de dikare merem û komployên rejîmê rastî têkçûnê bike û rêya xapandina raya giştî jê qut û asteng bike.

Di vê derheqê de çavnihêriya me ji hemû neteweyên Îranê bi giştî û bi taybetî xelkê azadîxwaz yê Kurdistanê eva ye ku bi çaveke vekirî ji rastiyan binêrin û bi hûrbînî mêzeyî komployên rejîmê û mifahwergirtina nebaş ji deng û amadebûna wan li ser sindoqên dengdanê bikin û bi xwe ne berbijarkirin û neçûna bo ser sindoqên dengdanê hem xweşnavbûna xwe û berjewendiyên giştî û girîng ên xelkê biparêzin û hem rejîma Komara Îslamî ji gihîştina bi armancên qirêj û mirar û komployên dijî gelî yên wê tevî têkçûn û sernekevtinê berbirû bikin. Bi taybet di wê rewşa nazik û hestiyar de ku Komara Îslamî tevî kirîz û pirsgirêkên hundirîn û derveyî berbirû ye, dixebite ji her delîve û fersendekê bi qazancê man û parastina desthilata xwe mifahê jê bistîne.

Werin em bi helwesteke jêhatî û şoreşvanî çeper û meydana vê şanosaziyê li rejîmê berteng bikin û rêyê nedin ku ev rejîme henekan bi berçavî û nirxên demokratîk û kesayetiya yek yeke dengderan bike.

Partiya Demokrat Ya Kurdistana Îranê
Deftera Siyasî
23.07.1385
15.10.2006

www.civakweb.org

Mijarek Li Ser Şêwrên Îslamî Yên Gund Û Bajaran Di Komara Îslamî De

Nivîsîna: Kawe
Wergeran: Hemîd Muxtarî

Ezmûnên 27 salên borî ev yek xuya kiriye ku ne tenê şêwrên Gund û bajaran, belku nûnerên Perlemana Şewra Îslamî û heta Serok Komar û kabîneyên dewletê jî nikarin xizmetên rastîn ji xelkê re bikin.

Şêwrên Gund û Bajaran di welatên demokratîk de, yanî pira navbera xelkê û berpirsan ji bo baştir nasandina arîşe û pirsgirêkan û danîna piroje û pirogiram û bernameyan ji bo zêdekirina astê xizmetkirinê û herwiha ji holê rakirina zilm û gendeliya tax û herêman pêşîgirtina ji serberedayiyê û biryardanên take kesî û selîqeyî, ji bo pişikdarkirina raman û hizr û selîqeyên hevwelatiyan di nava civakê de û ji hemûyan girîngtir pêkanîna têkiliyên nêzîk di navbera xelkê û nûnerên wan di Parlemana Şewran de ji aliyê Şêwrên Gund û Bajaran ve û di encam de piştrast û xatircem bûna xeyala hevwelatiyan ji vê yekê ku hemû ew biryar, diyarîkirin, hilbijartin û pejirandiyên ku hatine kirin, ji rêya gotûbêj û agehdarî û razîbûna nûnerên wan û bi awayekî nerasterast ji aliyê wan ve birêve diçe. Lê ger mirov bi awayekê xasmanî lê binêre jêre eyan dibe ku biryar û ramanên hevwelatiyan û tex û qatên cur bi cur yên nava civakê bandora pozetîv û erênî derheq rewşa nebaş ya civakê tune bûye. Çima? Çimku:

Yekem: Desthilat tu bihagiraniyekê ji bo pişniyaz û raman yan biryarên berevajî wan siyasetên ku di pêşde ji aliyê wan ve hatiye darêtin û diyarîkirin, jêre nade. Çimku hertim di pêşde biryar ji aliyê girûpeke desthilatxwaz, berçavteng û zorxwaz ji bo hevwelatiyan tên diyarîkirin.

Duyem: Ew kesên ku weke Şêwrên Gund û Bajaran tên hilbijartin, asta hişyarî û siyasîbûn û têgihîştina wan ne bi vê qasê ye ku bikarin ji xelkê û civakê re xizmetê bikin, lewra dema ku rewşa nebaş û tijî arîşe û asteng ya civakê dibînin, taze tên ser vê baweriyê ku ji xelkê re hilametekê pitir ninin û eşkere dibe ku armanca desthilatdaran ji hilbijartina Şêwran tenê û tenê jêstgirtî û bizavkirina demokrasiyê ye. Xwediyên desthilatê pêwîstî bi hilbijartinên rûyekî hene, encama hilbijartinan çi be, ji wan re ne girîng e. Ji wan re tenê asta pişikdariya xelkê û birêvebirina hilbijartinan girîng e! Heta ku bikarin li hember civaka navneteweyî û saziyên parêzvanên mafê mirovan xwediyê piropagend û manor û hêza zaftir bin û xwe zêdetir reben û belengaz nîşan bidin.

Sêyem: Li rewşeke han de kesên ku bo Şêwrên Gund û Bajan tên hilbijartin, rîskê nakin û xizmetkirina bi dezgehên zaf yên zext û tepeserkar ên rejîmê li serweyî xizmetkirina bi xelkê re dibînin û di vê derfetê ji bo qazanc û berjewendiyên xwe yên madî û taybetî mifahê werdgirin û biryar û pejirandî û tekoşîna xwe li çarçoveya Şaristanî û kar û barên destpêkî û ne yên pêwîst de kurt dikin.

Serbarê pişikdarîkirin di dizîn û rişwetxwarinê de, diçine nava rêza dûr û dirêj ya kesên ku di salên borî de pira di navbera dezgehên tepeserkar û xelkê bûne û rewşa 27 salên derbasbûyî didomînin. Ron û eşkere ye ku her kesek di her pile û berpirsiyariyekê de, çi Şêwra Bajar be yan nûnerê Parlemanê û heta birêveberê îdarê yan kesek ku di îdareyên dewletî de mijûlê kar be, herwisa bi



rehetî nikare ji destê kesên ku têkilî bi Wezareta Sîxor û Ewlekariyê hene, rizgar be û daxwaza alîkarî û sîxoriyê ji bo vê wezaretê ve ji aliyê wan ve lê tê kirin. Dezgehên ajan û Ewlekariyê heta pêşniyaza karê sîxoriyê ji kesên sivîl re jî dikin. Bo mînak kesek seba windakirina paseporta xwe, çûna bo derveyî welat jêre hatibû qedexekirin. Navhatî dema ku ji bo çareserkirina pirsa xwe seredana îdareya paseportê dike, tu pirsyarek derheq çawaniya bizirbûna paseportê jê nahê kirin û ji bo çareserkirina pirsa wî daxwaza hevkarî û karê sîxoriyê lê tê kirin!? Yan bo mînak kesek din ji bo damezirandina defter yan binkeyeke "zewicîn û ji hevveqetiyanê" hewce ye dezgeha sîxoriyê kêrhatîbûna vê binkeyê bipejirîne û navhatî jî piştî serdana vê îdareyê pêşniyaza qise anîn û birin ji bo vê dezgehê pê hatibû kirin. Mixabin niha her kesek ji bo çareserkirina kar ya pirseke xwe serdana îdare û binkeyên rejîmê bike, kirêgirtî û sîxorên rejîmê dûre diçin û ji bo çareserkirina kêşe û pirsa wê/wî daxwaza karê ajan û sîxoriyê lê dikin.

Lewra Şêwrên ku kêrhatîbûna wan ji aliyê dezgehên Sîxoriyê ve hatiye pejirandin, diyare ku dibe tu têkiliyek tevî vê dezgehê hebe.

Bi vî awayî xuya dibe ku Şêwrên Gund û Bajaran erkên xwe encam nadin û ger hindek kes jî bixwazin di nava Şêwran de erkên xwe birêve bibin tên perawêz kirin, yan dikevine ber şopa kerb û kîna desthilatxwazan.

Derheq pişikdarîkirina xelkê di hilbijartinan de, li destpêkê de divêt em diyar bikin ku li ser çi tex û qatekê xelkê diaxivin? Gelo em derheq wan kesan diaxivin ku li ser vê baweriyê ne ku ger di hilbijartinan de pişikdar nebin, bîtaqeya malbata wan dê were qutkirin, yan gelo em basê wan kesan dikin ku ji aliyê "Komîta Êmdad" û "Bihzîstî"yê ve tên piştevanîkirin û mehane meaşeke pirkêm ji wan re tên dan û seba vê çendê ku ev meaş û mehane ji wan nehê qutkirin, her terze daxwazeke heq û neheq ya rejîmê qebûl dikin. Erê gelo basê wan karkerên dewletî bikin ku ji tirsa binkeyên neyasayî yên zêrevaniyê neçar in di hemû qadekê de amade bin û yan basê wan xwendevan û xwendekaran bikin ku her yek ji wan bi awayekê tirs ji pêşeroja xwe hene û hertim evrên bi qirêj û reş ya bijar per û baskên xwe bi ser esmanê raman û hizra wan de kîşandiye.

Lewra di rewşeke wiha de mirov nikare li ser hizr û ramanên xelkê hisêbê bike, çimku bi dirêjahiya çendîn sala ye ku xelkê welatê me berevajî hizr û baweriyên xwe dilivin.

Xelkê me bi başî dizanin ku dengê wan tu bandorek li ser baştirbûna rewşa heyî, tenahî û pêşkevtinê, ji holê rakirina zilm û destkurtî û gendelî û laşfirotinê, birêvebirina dad û wekheviyê û rakirina tund û tûjiyê û wd ... tune ye û heta dizanin ku dengê wan di rewşeke han de pitir dibe harîkarê zilm û zordariyê, lê dîsan li xêncî xizm û kes û kar û girêdayî yên rejîmê hejmarek ji xelkê civaka me bi baldan bi wan şiroveyên serê diçine ser sindoqên dengdanê!

Pirsgirêka xelkê me di piraniya waran de tirs û gef e. Salên berê rejîmê ev rûyê veşartî yê xwe bi xelkê sivîl û bê guneh re daye nîşandan û xelk bi giştî dizane ku li piştê vê rûyê reben û rûyekî û dadxwazane ya rejîmê, gureke xwînmij û dirinde xwe veşartiye û her dema ku bi hewce bizane bê wê çendê ku tu tirsek ji sazî û rêxistinên navxweyî û navneteweyî hebe, dê bikeve can û malên civatên xelkê di civakê de. Divêt tama şirîn ya demokrasiyê û desthilatdariya xelkê bi ser pêşeroja xwe, dad û wekhevî, azadî, pêşkevtin, tenahî û jiyana baştir di nava takên civakê were cîbicîkirin û hemû wê yekê hîn bin, da ku tirs û nerihetiya wan ji destkurtî, tund û tûjî û zilm û zordariya rejîmê jî ji nav here.

Derheq pişikdariya xelkê di hilbijartinan de divêt were gotin ku tu tiştek ji pişikdariya xelkê di hilbijartinan de baştir nine. Pişikdarî di hilbijartinan de yanî desthilatdariya xelkê bi ser çarenivîsa xwe û diyarîkirin û guhertina wê. Lê bi baldan bi rewşa niha ku kesayetiyên rewşenbîr, azadîxwaz, dadperwer û demokrasîxwaz di civaka me de seba yasayên dest û pê gir û pir ji asteng, fîltirîng û destên veşartî yên rejîmê nikarin xwe bikin berendamê Parlemanê Şêwran yan Şêwrên Gund û Bajan û ger bi kêmî kesayetiyên azadîxwaz hebin ku amadebûna xwe eyan bikin, hertim kêrhatîbûna wan ji aliyê "Nizareta Istisvabî" (zêrevaniya hilbijatina herî baştir) ve ku girûpek in ne hilbijartî bi navê "Şorayê Nigehban" (Konseya Parastinê) tên redkirin û bi giştî kesên nexwendewar, nezan û ser bi desthilatê ji bo van erkên girîng tên berbijarkirin û em bi curekê dikarin bêjin ku bi awayekî nerasterast ji aliyê rejîmê ve tên hilbijartin. Pişikdarîkirin di hilbijartinan de ne bi qazancê xelkê û welatê me ye û pişikdarî nekirin di hilbijartinan de nîşaneya nerazîbûneke pan û berfireh û xelkî û aştîxwazane ye ku hem gefeke mezin bo ser desthilatdaran e û herwiha cîhana derve jî dê baştir bikarin derheq çawaniya rewşa heyî di Îranê de biryarê bidin û can û malê xelkê jî nekeve ber tirs û herwiha tirs û nerehetî ji bo xelkê û civakê pêk nahê.

www.ankaraforg

Tu Bêjî Agirbesta Vê Carê Ya PKK'ê Aştî Lê Bikeve?

Ferhad Ekberî
Wergerandin bi Kurmancî: Şakir

Partiya Karkerên Kurdistanê (PKK), di van çend rojên derbasbûyî de (01.10.2006)'an, li ser daxwaza Serok Komarê Îraqa Federel, Rêzdar Celal Talebanî û Rêzar Mesûd Barzanî, Serokê Herêma Kurdistanê û her wiha dewleta Amerîkayê agirbesteke yekalî îlan kir, ku belkî bikare derfeteke din ji bo aştiyê biafirîne û dawî bi siyaseta kuştin û qirkirinê ya zêdetir li du dehsalên derbasbûyî bihê û bi girtine bera rêya diyalog û gutûbêjê, dawî bi eqliyeta şovenîstî û leşkerî bîne û çareseriya demokratîk ciyê tund û tûjiyê bigre.

Ragihandina biryara agirbestê bûye sebebê şabûn û keyfxweşiya hemû ev hêz û aliyane ku dixwazin şer, xwînrijandin were sekinandin û di rastî de dixwazin li gor guhertinên dever û cîhanê, zimaneke din di nav netewên herêmê de zal be û pêşiya li pevçûn û şerê herêmî û hundirîn bigire.

Berevajî hewlên ku di panzde salên derbasbûyî de ji aliyê PKK'ê ve ji bo bi dawîanîna şerê han hatine dayîn, agirbesta vê carê li gor van givaşên ku ji hemû aliyan ve xistine ser dewleta Turkiyê û nemaze rola rasterast ya Kurdan (di du astên Îraqê û herêmê de), Amerîka û Ewropa, wisa tê ku hêdî hêdî encameke ciyê rezamendiya wan aliyane lê bikeve û doza Kurd biçe nava çarçoveya rastî û hajayî xwe û li tev buxtanên ku heta niha dewleta şovenîst ya Turk xistiye ser, bihê paqijkirin.

Bi merema peydakirina rêçareyeke jêhatî, dewleta Amerîkayê General Cozêf Ralîson, weke nûnerê taybet ê xwe ji vê pirsgirêkê re diyar kiriye ku rê li vê siyaseta Turkiyê bigire ku di vê derheqê de, zirarê digihîne berjewendiyên wî ewelatî.

Herwiha karbidestên Yekîtiya Ewropayê jî daxwaz li hikûmeta Turkiyê kirine ku ji bo pêkanîna reformek demokratîk bo çareserkirina doza Kurd li rêya bi fermî naskirina mafên neteweyî û kulturî yên wan, hewlên micid bide. Di asta herêmê de jî, bi

qutkirina yek ji hilqeyên şovenîst û nejadperestiyê (li Îraqê de) êdî rêberên Kurd rê nadin domkirina ev cure siyasetên kilasîk ku heta niha welatên desthilatdar li ser Kurdistanê, girtine pêşiya xwe û tenê bi zimanê agir û hesin tevî daxwazên rewa û demokaratîk yên neteweya Kurd tevdigerin. Ev jî bi xwe peyameke rohn bû bo wan welatên ku êdî neçar in guhertinan bi ser raman û nêrînên xwe de bînin û stûyê xwe li hember van rastiyan bitevînin ku piştî ji navçûna rejîma Bees damezirandina hikûmeta Federal ya Herêma Kurdistanê, derketiye holê û sînorekê bo siyasetên xwe yên şaş danîn, çunku ev siyasetên bi vî rengî tevî berjewendî û pirojeya nû ya Rojava bi giştî û Amerîka bi teybetî ji herêmê re li hev nahên ku pirsgirêka Kurd wek pirsgirêkeke derveyî herêmî û cîhanî, ciheke taybet tê de girtiye. Bi balkişandin bi van rastiyane, piraktîzekirina her cure siyaseteke nedemokratîk û têkder ya wê rewşa nû, tê wateya dijberiyê tevî zimanê nû yê çareseriya pirsgirêkan.

Eva ku di vê navberê de cihê baldanê ye, eva ye ku helwesta Amerîka û serokatiya PKK'ê gelek bi dilê dewleta Turkiyê nebû. Çimku tevî vê siyaseta ku Turkiye bawerî pê heye û di nava raya giştî ya xelkê vî welatî zeliqandiye, li hev nahê. Turkiyê ku heya niha siyaset û kiryarên xwe yên Leşkerî di Bakûra Kurdistanê û deverê de, bi navê şer tevî terorîzmê de kiriye mihane û hêcet û îdeayê dike ku li dijî terorîzmê şer dike! lewra niha ku tevî bîr û rayên cuda yên cîhanê û herêmê di vê derheqê de rûbirû bûye, ev jî pirsa neteweyek nêzîk bîst milyonan di Bakûrê Kurdistanê de ye ku bi tevahî siyasî û demokratîk e û divêt li gor pirensîpên îroyîn yên cîhanê, bi awayeke siyasî were çareserkirin.

Bêşik ev zext dibe sebebê vê ku dewleta Turkiyê bi siyasetên xwe de here ku bawerî bi **yek netewe**, **yek ziman** û **yek çandiyê** heye.

Ev jî çand, ziman û neteweya Turk e û hebûna tu ziman, çand, netewe û heta oleke cuda ji ola dewletê bi fermî nas nake û bi hemû hêza xwe dixebite bi yekalîkirin û ji navbirina hemû cudabîrên ku li hundirê (çarçoveya) neteweya Turk de hene. Her çend ku divêt ev hevdengî û vîna cîhanî, herêmî û Kurdî ya vê carê bi destpêka qonaxeke nû ya tevgeriyanê tevî doza Kurd were hesibandin. Lê serbarê vî halî jî, ji hêla vê çanda nejadperestane û tundrew ku di Turkiyê de zal e, nabe em hêvî bikin bi wê lezgîniya ku riha nûjen û guhertinan dixwaze, pirsgirêka Kurd biçe asteke siyasî de. Lê hêdî hêdî cihê xwe yê berheq û rewa di asta siyasî de peyda dike.

Civîna Nûnerên Partî Û Rêxistinên Kurdistanî Tevî Komîsyona Mafê Mirovan Ya Parlemana Almanyayê

Roja çarşemiya borî, 19'ê Oktobra 2006'an, li ser vexwendina Komîsyona Mafê Mirovan ya Parlemana Almaniyayê civînek bi armanca baskirin li ser rewşa mafê mirovan li her çar parçeyên Kurdistanê, di Parlemana Almaniyayê de hate lidarxistin.

Di vê civînê de 11 Parlemantêrên endam ên Komîsyona Mafê Mirovan, nûnerê Wezareta Derve ya Almaniyayê û hejmareke zaf ji rêveber û hevkarên Komîsyona navhatî pişikdarî kiribûn. Her wisa di vê civînê de nûnerên hemû feraksiyonên Parlemana Almaniyayê jî beşdar bûn.

Vekirina civînê bi axaftina rêzdar Xatûna Dr. "Herta Daulber - Gmelin", Wezîra berê ya Dezgehê Dadê û Seroka niha ya Komîsyona Mafê Mirov ya Parlemana Almaniyayê dest pê kir û piştî bixêrhatinkirina nûnerên Kurd û nasandina wan bi beşdarên civînê, daxwaz ji mêvanên civînê kir ku pitir li ser mijara civînê biaxivin.

Di destpêkê de Dr. Ehmed Berwarî, nûnerê YNK'ê ya Îraqê ku bi nûnerayetiya PDK'ê ya Îraqê jî beşdariya civînê kiribû, li ser guhertinên herî dawî yên Kurdistana Îraqê axivî û di vî warî de basek pêşkêşî pişikdarên civînê kir û helwêsta Hikûmeta Herêma Kurdistanê û her du partiyên sereke yên Kurdistanê anku PDK'ê û YNK'ê diyar kir.

Piştre rêzdar Dr. Mîro Eliyar, nûnerê PDK Îranê li ser rewşa mafê mirovan di Kurdistana Îranê de û herwisa rola yasaya bingehîn ya Komara Îslamî ya Îranê di binpêkirina mafê mirovan di Îranê de qise kir û îşare bi siyaset û helwêstên PDK Îranê li derheq pirsên girîng yên Kurdistanê û Îranê kir.

Piştre rêzdar Siyamend Haco, nûnerê **Navenda Ewropayê bo lêkolînê li ser Kurdan** li ser arîşe û pirsgirêkên Kurdên Sûriyê û rewşa mafê mirovan di vê pişka Kurdistanê de axivî.

Piştre rêzdar Ebûbekr Seydam(Beko), berpirsê **Rêxistina Navneteweyî ya Mafê Mirovan ya Kurdan** axivî. Navhatî di axavtina xwe de bi pêkanîna pirsgirêk û astengan li hember wan guhertinên mafê mirovan kir ku ji aliyê desthilatdarên Turk ve tên holê.

Di dawiya vê para civînê de rêzdar Metîn Înceso, Serokê **Navenda Belgename û Lêkolînên Kurdî** Li Almaniyayê tevî îşare kirin bi hindek aliyên din yên binpêkirina mafê mirovan di Kurdistana Turkiyê de, li ser rewşa koçberên Kurd di Almaniyayê de axivî.

Duyemîn pişka civînê ji bo pirsên nûnerên Parlemana Almaniyayê ji mêvanên Kurd li vê derheqê ve hatibû terxankirin.

Di dawiyê de her du aliyan encama civînê gelek baş û serkevtî nirxandin û li ser domandina diyalog û civînên han tekez kirin.

www.agirî.org

Birêveçûna Duyemîn Kongireya Partiyên Kesk Yên Welatên Ewropayê Li Welatê Swîsê Û Derkirina Daxuyaniyekê Li Ser Îranê Û Kurdistana Îranê

Duyemîn Kongireya Partiyên Kesk yên welatên Ewropayê li bin dirûşma **"Pêşerojeke Kesk û geş ji bo Ewropayê"** di rojên 11.13 û 15'ê Oktobera sala 2006'an de li bajarê Jineva (Cenev) a welatê Swîsê li yek ji salonên zanîngeha Jinêvê birêve çû.

Ji aliyê organîzeker û birêveberên Kongireya navhatî, Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê jî berê bi fermî hatibû vexwendin, pişikdarên şanda PDK Îranê di vê Kongireyê de pêk hatibûn ji Dr. Xusro Ebdulayî, berpirsê pêwendiyên Navneteweyî yê partiyê li derveyî welat, Adil Elyasî, berpirsê pişka pêwendiyên partiyê li Swîsê û Bawa Elyasî, cîgirê berpirsê pişka pêwendiyên partiyê di vî welatî de.

Aliyên mijar û basên girîng yên vê Kongireyê pêkhatîbûn ji: Siyaseta Ewropayê derheq mafê mirovan di serdemê terorîzmê de, jîngeh û parastina vê, pirsa penaber û koçberan, mijara cîhanîbûnê, (Globlîzasiyon), dadperweriya civakî, bas kirin û pejirandina biryarnameyekê bi navê "Pêşerojek kesk û geş ji bo Ewropayê" û qebûlkirina pirensîpên bingehîn yên partiyên Kesk.

Di vê Kongireyê de, di nava 30 welatên Ewropayê de, xincî 31 partiyên Kesk, nûnerên çendîn partiyên Kesk yên din li parzemîn (qare) û welatên cur bi cur yên cîhanê pişikdar bûn.

Di heyamê sê(3) roj kar û xebata duyemîn Kongireya Partiyên Kesk yên welatên Ewropayê de, heyeta nûnerayetiya PDK Îranê, serbarê pişikdariya çalakane di hemû basên civînên vê kongireyê de, li kêleka kar û xebata Kongireyê de, hevdîtin tevî Komek zaf û berçav ji parlemanter, kesayetî, şandên nûnerên pişikdar yên partiyên Kesk di Kongireyê de, nivîskar û rojnamevan ku di piraniya wan hevdîtinan de, basê rewşa mafê mirovan di Îranê de, Îran weke bingeha terorîzma navneteweyî piştevanî û piştgiriya Rejîma Komara Îslamî ya Îranê ji hêzên tundrew û Îslamî, tengbûna çarçoveya azadiya derbirîna ra û nêrînan pêkhatina zext û givaş û astengan ji bo rojname û belavokên ne dewletî, girtin û zîndanîkirina rojnamevanan, nivîskar û rewşenbîran, xebat û tekoşîna mafxwazane ya neteweya Kurd di Kurdistana Îranê de bi rêberayetiya PDK Îranê, pirsa çekên Etomî, binpêkirina mafê jinan û diyarîkirina federalîzmê weke dirûşma Partiya Demokrat û Kongireya Neteweyên Îrana Federal hatne ber basê. Pişkek ji wan Parlemanter, kesayetî û ew aliyên ku desteya nûnerayetiya Partiya me hevdîtin û rûniştin bi wan re pêk anîbû, navhatî ne ji: Xatûna Kilawdiya Rot, yek ji berpirsên Partiya Kesk ya Almaniyayê, û endamê Parlemana Ewropayê, birêz Daniyel Kon Bêndît, xebatkar û tekoşerê naskirî û navdar yê Partiya Kesk ya Almaniyayê, birêz Hubêrt Şûrkîndên, Sekreterê Giştî yê Partiya Kesk ya Swîsê, birêz Olî Loyîn Bêrgir, Cîgirê Sekreterê Giştî yê Partiya Kesk ya Swîsê û endamê Parlemana Swîsê û heval û dostê nîzîk yê Kurdan, Xatûna Domînîk Voanay ji berpirsên Partiya Kesk ya Firansayê û berpirsê Serok Komariya vî welatî bo sala 2007'an û hwd...

Piştî bas û guhertina bîr û rayan ji aliyê şanda PDK Îranê tevî berpirsên Kongirê, beyannameyek li ser rewşa mafê mirovan û tepeserkirin û qirkirina xelkê Îranê û gelê Kurd di Kurdistana Îranê, ji aliyê rejîma Komara Îslamî ya Îranê, hate pesendkirin ku deqa beyannameyê bi awayê jêr e:

Daxuyaniya duyemîn Kongireya Partiyên kesk yên welatên Ewropayê li ser Îranê û Neteweya Kurd li Kurdistana Îranê:

"1. Kongireya duyemîn ya partiyên Kesk yên welatên Ewropayî piştgiriya xwe ji xebata hêzên demokratîk yên Îranê di pêxema cîgirkirina aştî, azadî û demokrasî di Îranê de dike.

2. Kongire, tepeserkirina civatên xelkê Îranê, bi xasmanî rojnamevanan, nivîskaran, xwendekaran, berpirsên sendîkayên kedkaran, jinan, alîgirên mafê jinan, kêmaniyên olî, neteweyên zilmlêkirî yên Îranê û bixasmanî neteweya Kurd di Kurdistana Îranê de, ji aliyê rejîma Komara Îslamî a Îranê bi xurtî Mehkûm û şermezar dike.

3. Kongire ji xwastik û daxwazên berheq û demokratîk yên neteweya Kurd li Kurdistana Îranê di çarçoveya damezrandina sîstemeke peloralîstî, demokratîk û Federal di Îranê de piştgiriyê dike.

4. Kongire azadiya dest bi cî û bê şert û merc a girtiyên siyasî û ramanê û sekinandina siyaseta hemû awayên ferq û cudahîdananê li dijî jinan di Îranê de dixwaze.

Duyemîn Kongireya Partiyên Kesk yên welatên Ewropayê, di encamê de li demjimêr 13'ê piştînîvroya roja yekşem, 15.10.2006'an de dawî bi kar û xebatên xwe anî.

Hêjayî gotinê ye ku PDK Îranê, take partiya Îranî û Kurdistanî ya pişikdar di vê Kongireyê de bû ku bi awayekî fermî hatibû vexwendin.

Li Şûna Hevkariyê, Rejîm Daxwaza 35 Milyon Tûmenan Li Rêxistina "NGO" Ya "Jiyaneve" Dike

Li bajarê Sine, midehekê berî niha rêxistineke ne dewletî (NGO) ya bi navê "Jiyaneve" bi merema hevkariyê tevî kesên muted bi madeyên hişber û sirker ava bû. Rêxistina han tevî wan mutadan ku xwe jê re dinasandin(Mutadên xwed muerif) hevkariyên hewce dikirin ku bikarin ji madeyên hişber dûr bikevin û careke din saxlemiya xwe bidest bixin.

Li ser cadeya di navbera bajarên Sine û Kiramaşanê de, ji aliyê îdareya "Bêhzîstî" ya Parêzgeha Kurdistanê xîvetgehek ji rêxistina navhatî re ji bo nîştecî û dermankirina mutadan hate dan, lê Parêzgariya Kurdistanê ji bo dayîna elekterîkê ji xîvetgehê re daxwaza 35 milyon tûmen dike. Di demekê de ku rêxistina "NGO" ya "Jiyaneve" tu dahatek tune ye û merema wê jî tenê pêşîgirtin ji jordeçûna îtiyadê ye.

Hêjayî gotinê ye ku rejîma Melayan û kirêgirtiyên xwe rolê sereke û girîng di belavkirina berfireh ya madeyên hişber di Kurdistanê de hene, ji ber vê çendê ye jî ku nahê çavnihêrîkirin ku hevkariya "NGO" yekê bikin ku bi merema vejandina nû ya mutadan û berlêgirtina belav û berfirehbûna madeyên sirker, dixebite.

Rêxistina Kurdî ya "Jiyaneve" daxwaza ew kesên ku madeyên bêhişker dikişînin, derman bike, lê dewlet li hember vî karî de astengan pêk tîne, ji ber ku ne bi dilê dewletê ye!!!

www.agirî.org

Tawanbarbûna Berpirsên Heftenameya "Rojhelat"ê Hate Ragihandin

Li gor agehiyên vê dawiyê yên gihîştî li Rojhilatê Kurdistanê li ser rewşa rojnamevanên girtî yên heftenameya "Rojhelat"ê, (Saman Silêman, Ferhad Emînpûr û Reza Elîpûr) rojnamevanên han seba wergirtina qaseke zaf dirav li hin kes û çavkaniyên pêwendîdar bi Amerîkayê re ji bo piropagendeyên neteweyî û alozkirina raya giştî bi merema lawazkirina Komara Îslamî di Îranê de, ketine ber buxtanan û tawanbar hatine zanîn.

Li gor nûçeyeke "IRNA"yê, Birêveberê Dozgeriya Giştî ya Kurdistanê, Elîekber Gerosî, derheq hegera girtina rojnamevanên heftenameya navhatî got:

"3 kes ji endamên Desteya Nivîskar ya vê heftenameyê bi buxtana wergirtina qaseke zaf dolaran li hin kesên pêwendîdar bi Amerîkayê re li Başûrê Kurdistanê de û ji bo piropagendeyên siyaseta cudahîxwaziya neteweyî û alozkirina bîr û raya giştî, bi merema lawazkirina Komara Îslamî, ji aliyê Dozgriya Giştî ya Dadgeha Şoreşa Îslamî ya bajarê Sine ve hatine girtin û dosya van di bin lêkolînan de ye"

Navhatî got: "Tawanbaran bi eşkere îtiraf bi tawanên xwe kirine û gotine ku piraniya hewcehî û pêdiviyên birêxistina heftenameya "Rojhelat"ê, ji wî diravê ku di pêşde qala wê hatibû kirin, hatibûn amadekirina, ji bilî vê çendê jî li hember belavkrina her hejmareke vê heftenameyê de, qaseke din pere ji wan re hatiye dayîn".

Gerosî, di doma axavtinên xwe de got: "Kiryara han ku girûpek li Başûrê Kurdistanê dikin û çavkaniya malî(aborî) ya belavkirina heftenameya han qebûl kirine, maytêkirina eşkere di kar û barên hundir yê Îranê û li dijî yasaya çapemenî û hindurê welat e û hewceyî cezadanê ye".

Her di vê derbarê de Komîteya Berevanî ji Rojnamevanên Kurdistanê di daxuyaniyeke çapemeniyê li Kurdistana azad de girtin û bê ser û şûn kirina 3 Rojnamevanên Heftînameya Rojhelatê şermezar kir û ji rayedarên Îranê xwast ku di dema herî zû de wan serbest berde.

Gerek Kurt Di Dîrokê De ...

Amadekar: Nûredîn Sofîzade

16.10: Roja Cîhanî ya Xwarinê.
16.10.1987: Berpirsê Komîte Şaristana Pîranşarê, **Rehîm Mehmûdî** hate şehîdkirin.
17.10.1925: Rêxistina Komeleya Gelan piştî ji nav çûna şoreşa Şêx Mehmûd ji dewleta Birîtaniyayê xwast ku di Kurdistanê de dewleteke serbixwe ya Kurdî ava bikin, lê ji ber vê çendê ku di berjewendiya dewletên Rojava de nebû, ser negirt.
17.10.1994: Heyranbêjê dengxweş, hunermend Resûl Gerdî xelkê Hewlêrê koça dawiyê kir.
17.10.2005: Vegerandina termê 500 kes ji wan 8000 Barzaniyên Enfalkirî ji aliyê rejîma Bees ve bo nava axa Kurdistanê li Hewlêrê û piştre li devera Barzan hatin veşartin.
18.10.1985: Li ser rêya Duav û Banê, desteyeke 12 tirimbêlî ya hêzên Komara Îslamî ketin nava boseya Pêşmergeyên PDK Îranê û bi tevahî ji nav çûn. Nêzîk 100 kes ji dijmin hate kuştin, lê du Pêşmerge bi navên 1- Husên Ekberdoxt 2 – Mam Seîd Mehdî şehîn bûn.
19.10.1950: Hêzên Rêxistina Neteweyên Yekgirtî bi Serokatiya Amerîkayê welatê Kureya Bakûr girt.
19.10.1994: Fermandê Hêza Agirî, **Hemze Bêhnam** li gundê Nuwe ya herêma Mirgewer di şerekê de ji aliyên hêzên Komara Îslamî ve hate şahîdkirin.
20.10.1963: Nilson Mandêla, rêberê neteweperest ê Afrîqayê hate girtin û darizandin û pitir ji 20 salan di girtîxaneyê de ma.
20.10.1986: Li şerek giran di navbera hêzên rejîmê û Pêşmergeyên PDK Îranê yên, Hêza Zimzîran li Nelosê da, pitir ji 50 kes ji hêzên rejîmê hatne kuştin, mixabin 8 Pêşmerge di şerê han de şehîd bûn: 1. Xalid Îbrahîmî 2. Mihemed Şemeî 3. Pîrût Ebdulahî 4. Resûl Mihemedî 5. Ehmed Neqşî 6. Rehman Gulistan 7. Osman Elîpûr 8. Simaîl Hesenî.
20.10.1987: Hunermendê mezin û stranbêjê bi nav û deng ê Kurd, Mamosta **Tahir Tufîq** koça dawiyê kir.
21.10.1945: Bo yekemîn car di welatê Firansayê de mafê dengdanê li hilbijartinan de bi jinan hate dan.
21.10.1996: Girtin û teslîmkirina 6 xebatkarên PDK Îranê ji aliyê Rêxistina Bizava Îslamî ya Kurdistanê bi rejîma Komara Îslamî ya Îranê. Navê wan 6 Pêşmergan en in: 1. Mihemedezîz Qadirî 2. Erşed Rezayî 3. Ednan Îsmaîlî 4. Yûnis Mihemedpûr 5. Mizefer Lazimî 6. Merûf Suhrabî. Çend salan piştî hingê kifş bû ku ew her 6 azadîxwazên Kurd hatine îdamkirin.
22.10: Roja Cîhanî ya Rêxistina Neteweyên Yekgirtî.
22.10.1959: Hecî Babe Şêx (Ebdulrehman Siyadet) koça dawiyê kir. Navhatî di pêkhatina Komeleya J-K de pişikdar bû. Piştî avabûna PDK Îranê di sala 1945'an de, li yekemîn kongireya vê partiyê de bû endamê Komîteya Navendî. Di hikûmeta Komara Kurdistanê de berpirsyariya Serok Wezîriyê pê hate sipartin.
22.10.1984: Mamosta Cegerxwîn, helbestvanê mezin û welatparêz yê Kurd koça dawiyê kir.
23.10.1959: Êrîşa berfireh a "Savak"ê bo ser endamên PDK Îranê. Nêzîk 250 kes ji endamên vê partiyê di seranserê Îranê de hatin girtin.
24.10.1880: Şêx Obeydula Nehrî bi hêzeke zaf ji şoreşvanên Kurd di êrîşekê de bajarê Urmiyê girt û desthilata hikûmeta Îranê hate birîn.
24.10.1935: Kovara "Ronakî" li Hewlêrê hate weşandin.
24.10.1945: Yekemîn Kongireya PDK Îranê li Mehabadê pêk hat ku ji Agirî heya Bokanê nûner têde beşdar bûn.
25.10.1922: Peymanek di navbera Îranê û Turkiyê de li ser Kurdan û bi xasmanî pêşîgirtin ji alîkar bi Simkoyê Şikak re hate îmzakirin ku peymaneke ewlekariyê bû.
27.10.1990: Hunermendê Kurd, Salih Dîlan koça dawiyê kir.
28.10.1923: Komara Turkiyê bi Serokatiya Mistefa Kemal bi fermî hate îlankirina.
29.10.1984: Di şerekê de tevî hêzên Komara Îslamî li gundê Bawan ya devera Somayê de, 3 Kadroyên PDK Îranê bi navên: 1. Kerem Keleşî 2. Bapîr Mewlûdî 3. Tacedîn Bêhnam şahîd bûn.
29.10.1991: Teqîna mayîneke çandî ji aliyê kirêgirtiyên Komara Îslamî di bin mînîboseke hilgirê Kadro û Pêşmergeyên PDK Îranê li ser rêya Enzelê 3 kes şehîd bûn û yên din jî birîndar bûn.
30.10.1989: Berendamkirina şehîd Dr. Qasimlo ji bo Xelata Nobel ya Aştiyê ji aliyê civata dostên gelê Kurd li Otrîşê. Her çend xelata vê salê Gurbaçof wergirt, lê her eva ku Dr. Qasimlo yekemîn Îranî û Kurd bû bona standina vî xelatî hate berbijarkirin, pirseke gelek girîng bû.
31.10.1985: Dîroknivîs û lêkolînvanê navadar yê Kurd, **"Qanatê Kurdo"** koça dawiyê kir.
31. 10 1986: Hêzên rejîma Komara Îslamî êrîşekî mezin kirine ser gundê "Xurimtel" li devera Serşîva Seqizê û di 4 qadan de Pêşmergeyên PDK Îranê berengarî wan bûn. Di şereke dijwar de pitir ji 100 kes ji hêzên rejîmê hatin kuştin û rastî têkçûneke xurt hatin. Di wî şerî de **Hekîm Rezayî,** endamê Komîteya Navendî ya PDK Îranê û berpirsê malbata 2 ya Başûrê Kurdistanê tevî 3 Pêşmergeyên din bi navên 1. Salih Mîrzayî 2. Sidîq Mîrî û 3. Mihemed Ehmedpûr şehîd bûn.

www.rizgarikurd.org

Bizava Jinan Û Cîhana Îslamê

Şîrîn Ebadî
Werger bo Kurmancî: Omîd Esxeran

Bi kêmî Mirov dikare welatekê peyda bike ku rewşa jinan têde ji ferq û cudahiyên hiqûqî û civakî bi dûr be. Herçiqas ku hinek car ev zilm û çewisandinane bi nepenî û hinek caran bi awayekî eşkere û hinek caran jî dibe qanûn û zagon. Di hinek deman de, herçiqas ku qanûn li ser yeksanî û wekheviya jin û mêran bîîsrar in, lê di kiryar de nayê cîbicîkirin û tê binpêkirin, di dawiyê de ewa ku rohn û eşkere ye, newekheviya jin û mêran di cîhanê de ye. Herçend ew berçaviye di welat û çandên cur bi cur de bi qaseke zaf û xurt tê dîtin.

Heta di Rojava de jî jin ji ber nebûna derfetên wekhev yên civakî bilome û gazinde ne, lê bi hegera wê çendê ku jinan du erkên cuda him li mal û him jî di civakê de hene, kêmtir dikarin bi qasê hewce ji mafên xwe mifahê werbigirin, yan wekî din nikarin ji wan derfetên ku ji wan re derbikevin holê bo jordebirina hişyarî û geşekirina xwe mifahê bistînin. Her ji ber vê sedemê ye ku em dibînin di piraniya welatên Rojava û Amerîkayê de asta wan jinên ku postên girîng bidest ve digirin, ji mêran kêmtir e.

Her ji ber wê çendê ye ku midehekê berî niha Parlemana Ewropayê qanûnek pejirand ku bi awayekê aliyên siyasî neçar kir ku hejmareke wekhev ji jin û mêran ji bo berendambûna Parlemana Ewropayê binasînin, lê serbarê vî halî jî jin hêşta di warê mifahwergirtin ji derfetên civakî ji mêran paştir in. Heke em ji rêjeya endambûna jinan di parlemanên welatên Ewropayê de binihêrin, ku di rastî de pêşengiya pêşkevtina jiyar û şaristaniyeta Rojavayiyan dikin wê demê dê ji me re derbikeve holê ku heta di van welatane de jî, Jinan heya çi qasekê karîne ji wan derfetên ku ji wan re pêk hatine, mifahê werbigirin. Eger em hindek welatên mîna welatên Îskandînavyayê jê derbikin, di gelek welatên Ewropayê de hejmara wezîrên mêr ji yên jin zêdetir in. Her wiha piraniya post û berpirsiyariyên girîng ên aborî jî di pawan û destê mêran de ne û hejmara jinên karbidest di van cure berpirsiyarane de gelek kêm in.

Lê rewşa jinan di welatên Îslamî de bi awayekî din û di qonaxeke cuda de ye û di rastî de pêka Qanûna Bingehîn ya wan welatane ne hêja û jêhatî ye.

Diyar e di van welatan de jî berçaviya cudahîdanînên zayendî pêka welatan pêk tê e. Di Erebistana Seûdî de jin hetanî çend salan berî niha ne xwediyê nasnameyê jî bûn, yanî di bingeh de ji mafê welatîbûnê bêpar bûn. Niha jî ku wekî hevwelatî tên hesibandin, ji gelek mafên xwe bêpişk in. Wan ne tenê mafê beşdarîkirin di kar û çalakiyên civakî û siyasî de tune ye, heya mafê ajotina otombêla xwe jî ninin. Di piraniya welatên din ên Îslamî de yek ji wan Îranê, herçiqas ku jin wek welatî tên hesibandin, lê bi welatiyên pile du tên nasîn û ji wan mafên ku mêran hene, bêpar in. Pirjinî(çendjinî) di piraniya welatên Îslamî de rêve diçe. Di hinek deveran de, rêz, hurmet û cihwarê jinan bi hejmara karên wan tê girêdan. Heta di hindik deveran de, jin ne bi navê fermî yê xwe, belku bi navê kurên xwe tê gazîkirin û navê wê nahê bikaranîn!

Lê pirsyara sereke li wir eva ye ku sedemên nebaşbûna rewşa jinan di welatên Îslamî de çiye? Îslam olek e ku wekheviya mirovan, bê liberçavgirtina nejad û zayend, qat û ... dipejirîne.

Lê ewa ku di welatên Îslamî de dibe egera dijberîkirin tevî mafê jinan, çand, kultur û kevneşopa mêrserdestiyê ye ku yê bûye sedema paşketina pêvajoya Modernîteyê di wan civakane de, ev berçaviye li gorî civakên Rojavayî gelek berçav û xuyatir e.

Kultura mêrserdestiyê ne tenê zilmê ji jinan dike û diçewisîne û wê weke zayenda pile du dizane, belkî dibe egera zilm û çewisandina mêran jî tevî demokrasiyê dijber e û tevî bîr û ramanên cuda û îdeolojîk yên din, karîna lihevkirinê nine û bawerî jî bi wekheviya mirovan nine.

Ev kultur û çand e her wekî çawa di asta welat de, weke zarokan ji welatiyan dinêre ku hewcehî bi çavdêrî û xwedîkirinê û jê re biryardan ji aliyê mezin û xwedan

desthilatan ve hene û bawerî bi beşdariya wan li birêvebirina kar û barê girêdayî bi wan re nine. Her bi vî awayî jî jin ne tenê di civakê de, belku li malbata xwe de jî wek **zayenda duyem** tên hesibandin.

Ew kesên ku di welatên Îslamî de piştevanî û berevaniyê ji çanda mêrserdestiyê dikin, ji bo parastina desthilat û berjewendiyên siyasî ên xwe bi hezaran rêsa û qanûnên olî guhertine û dîsan jî her wisa diguherînin.

Lê li wan ciyên ku bas ji lênihêrîn bi ser qaîde û rêsayên parêzer ên sîstema mêrserdestiyê çi di warê siyasî û civakî û çi di warê taybet bi mafê jinan de, li pişt serpûşa berevanî ji **nasnameya kevneşop û baweriyên olî** tê kirin, dijberî her cure guherînekê radiwestin ku qazancê wan dixe tirsê. Lê di asta cîhana Îslamê de jî herwek ciyên din yên cîhanê, pêvajoya ber bi pêş ya daxwazên rewa û berheq ên jinan bi destê kesê nehê zevtkirin. Îro rojê li Îran û Turkiyê re bigre heta nîvçe gireva Erebistanê, ji Bakûrê Afrîqa heta Asiyaya Navîn û ji Hindê re bigre heta Endonizyayê, bizava yeksanxwaziya jinan, di pile û astên cuda de yê ketiye liv û tevgerê. Aqibet rojekê ev bizave dê wisan daxwazên xwe li hemberî çanda mêrserdestiyê ku bêhûde û bêçineyî cehd û xebatê dike xwe li pişt rûpûşa nirx û bihayên olî û xwecihî biveşêre û bide selimandin ku xwestek û daxwaziyên wan werin girtin.

Mehmûd Ehmedînejad Tevî Pirojeya Konterola Nifûsa Îranê Dijberî Kir

Di civîna hevpar ya heyeta dewletê û nûnerên Parlemana Şêwra Îslamî ya Îranê de, Ehmedînejad, tevî pirojeya kontirola nifûsa Îranê dijberî kir û got: "Îran dikare heta 120 milyon kesan di xwe de cih bide. Eva ku dibêjin du zarok bes in, ez dijberî vê yekê me". Ehmedînejad pirojeya kontirola nifûsê ku ji aliyê piraniya welatan birêve diçe, destçêkiriyê Rojavayiyan da zanîn û got: "Welatên Rojavayê bi xwe pirsgirêkên mezin hene, çimku geşekirina nifûsa wan nerênî ye, ji vê yekê ditirsin ku nifûs û xulyaqetê me ji wan zêdetir be û em li ser wan de zal bin, bi vê sedemê pirsgirêkên xwe ji welatên din re dişînin". Ehmedînejad herwiha bêy eyankirina serhejmara bêşolî û

betaliyê, qasê kar û xebitînê di Îranê de zaf anî ziman û got ku ez li ser vê baweriyê me ku jinên Îranê divêt nîv dem kar bikin û piraniya dema xwe mijûlê perwerdekirina zarokan bin, lê miaşê xwe yê kemilî wergirin.

Jêder: "Radio Farda"

www.civakurd.org

Kurd Û Mafê Mirovan Di Komara Îslamî De

Kurdan hertim di dîroka hemdem ya Îranê de daxwazên xwe ji bo serxwebûnê li hember wan rejîman ku cehd kirine mafên wan sînordar bikin, di serdemê Sefewî, Qacar, Pehlewî de bi şoreş û serhildanê dane eyanê. Ne ewlehiya herî dawîn di sala 1979'an de bû ku encama vê şoreşa gelên Îranê ye. Mehabad ku di serdemê Şahebasê Sefewî de bûye navenda berxwedanî li hember desthilatdarên hikûmeta navendî, careke din bû çepera xebat ji bo Otonomiya Kurdan.

Piştî şoreşa sala 1979'an, givaşa herî xurt bo ser rejîma nû, ji aliyê şoreşvanên Kurd yên Kurdistana Îranê bû ku heyameke dûr û dirêj bû ji bo bidestveanîna mafên Kurdan xebat dikirin. Ayetula Xomeynî di roja 19'ê Agusta 1979'an de fermana Cîhadê li dijî gelê Kurd ragihand. Ji wê demê hetanî niha rejîma Îranê siyaseta êrîş li hember gelê Kurd de girtiye pêşiya xwe. Di encama vê Cîhadê de zêdetir ji 70 hezar kes Kurd hatin kuştin. Di encama şerê rejîmê bi xelkê Kurd re bingehên aborî, civakî, kulturî yên geşenekirî yên Kurdistanê ji nav diçe.

Destûr û Qanûna Bingehîn ya Komara Îslamî ya Îranê, çavkaniyek ji felsefeya rejîma Îslamî ye ku têde yasayîbûn û hewcehiyên cudahîdanan û newekhevî û bêedaletî li hember welatî û girûpên neteweyî yên cur be cur yên welat têde tên xuyakirin.

Li gor madeyên 50, 57 û 107'an yên Yasaya Bingehîn a Komara Îslamî, bilindtirîn binyata hikûmetê, pileya Rêber e ku li gor madeya 12'an a Yasaya Bingehîn divêt Melayeke Şîî be. Her li gor vê yasayê, Serok Komar, Wezîr û Serokê Perlemanê jî divêt Misilmanên Şîî bin.

Zêdetir ji 10 milyon Kurd di Îranê de dijîn ku para wê ya Sunî, pêka qanûnê wekî hevwelatiyên pile 2 tên hesibandin. Jinên Îranê ku nivîya civaka Îranê pêk tînin, mafê pişikdarîkirin di piroseyên siyasî yên welat de ninin.

Yasayên Komara Îslamî ya Îranê derheq cezayan, dîmeneke kemilî ji kiryarên rejîmê li hember girûpên neyar û dijber eşkere dike.

Li gor bendên 198 heya 211'an, li ser tolhildan û cezayan di Îranê de, hemû ew kesên ku li dijî rejîma Îranê xebatê dikin û alîkariyê didin opozîsyonê, dê li gor cezaya wan werin destnîşankirin û hewce ye bi vî awayî bihên cezadan:

1. Renge bihên gulebarkirin 2. Renge bihên îdamkirin 3. Renge destê rastê û pêyên wan yê çepê bihên qutkirin 4. Renge bihên dûrxistin. Wan kesan mafê vê yekê tune ye ku tevî tu kesê pêwendiyê bigirin û bi tu cihekê re seferê bikin. Sala derbasbûyî li gor belgeyan ji bilî Çînê, Îran xwediyê hejmara herî zaf ya îdaman di cîhanê de bû. Bi dehan girtî û welatiyên siyasî yên Kurd jî bi nepenî hatine îdamkirin ku belge û raporan îşare jêre nekirine, ji meha Julaya 2005'an hetanî niha, 429 kes ji aliyê hêzên ewlekariya rejîmê ve hatine kuştin, îdamkirin, hepsî û cerîme kirine. Di havîna borî de li dema xwenîşandanên Kurdan di Îranê de, 1700 kes hatine girtin ku çarenivîsa hejmareke zaf ji wan ne xuya ye. Di Kurdistana Îranê de her terze çalakiyeke partiyên siyasî qedexe ye. Rejîma Komara Îslamî çalakî û xebatên partiyên siyasî ne yasayî daye zanîn. Li gor benda 197 heya 202'an ya qanûna cezayê, endamên partiyên Kurd bi têkder tên naskirin.

Çalakiyên **NGO**'yan bi tundî tên kontrolkirin. Rejîma Îranê bona vê çendê ku xatircem û pişterast be ku NGO li dijî tenahiya neteweyî naxebitin, van dixin bin zêrevaniyê û tevî rêxistinên navneteweyî û hinartiyên din di Îranê de ji bo karê ajan û sîxoriyê mifahê ji wan distîne.

Di Kurdistana Îranê de, her cure çalakî û xebatek ji aliyê partiyên siyasî ve hatiye qedexekirin. Rejîma Komara Îslamî partiyên siyasî li Kurdistanê hiloşiyayî û ne qanûnî îlan kirine.

Di Îranê de hetanî niha xwendin bi zimanê Kurdî hatiye qedexekirin, aboriya Kurdistanê herifiyî ye û asta betalî û bêşoliyê gihîştiye 47 ji sedê. Komara Îslamî ya Îranê bi awayekî sîstematîk madeyên bêhişker di nava ciwanên Kurd de belav dike, heta ku bi mutadkirina wan pêşî ji çalakî û perwerdebûna wan weke endameke civakê bigire. Teqekirin yan gule avêtina çekdarên rejîmê yê bûye bi edet û bûyera rojane ya Kurdistanê. Rêxistina Neteweyên Yekbûyî daxuyaniyek li ser çareserkirina rewşa mafê mirovan li Îranê, di roja 16'ê Desembera 2005'an de pesend kir.

Serbarê vê biryara Neteweyên Yekbûyê, Rejîma Komara Îslamî ya Îranê, berdewam tund û tûjiya hovane li dijî xelkê Îranê didomîne.

Nimûneyên jêrîn pareke kêm ji binpêkirina mafê mirovan ji 16'ê Desambera 2005'an peyre di Îranê de ye:

- Hejmara çalakvanên siyasî yên darizandî, 3 kes
- Girtiyên siyasî yên ku hatine îdamkirin, 8 kes
- Hejmara van kesên ku ji aliyê hêzên ewlekariya rejîmê ve hatine kuştin, 32 kes
- Ev jinên ku bi kevirbaranê hatine mehkûmkirin, 4 kes
- Hejmara van kesan ku piştî girtinê hatine îşkencekirin, 10 kes
- Hejmara kesên ku piştî cirîmekirinê, serbest hatine berdan, 242 kes
- Hejmara kesên ku hatine îdamkirin, 25 kes
- Hejmara kesên ku bi mirinê hatine mehkûmkirin, 28 kes
- Hejmara kesên mehkûmbûyî bi mirinê û bin 18 saliyê, 2 kes
- Hejmara xwendekarên girtî ji bo lêpirsînê, 82 kes
- Hejmara kesên ku di tolhildanê (qesasê) de parek ji laşê xwe ji dest dane, 2 kes
- Hejmara xelkê zirardîtî yê Kurdistanê bi destê hêzên ewlekariya rejîmê, 1200 kes
- Hejmara rojname û kovarên daxistî, 43 Heb
- Hejmara girtiyên Kurdistanê ji aliyê hêzên ewlekariyê, 1700 kes
- Hejmara girtiyên ku temenê wan ji 15 salan kêmtir e, 1 kes
- Hejmara kesên ku temenê wan ji 15 salan kêmtir û bi destê hêzên ewlekariyê ve hatine kuştin 1 kes

Tund û tûjiya berdewam li dijî mafê mirovan di Kurdistana Îranê de encama serberedayî û givaşa hin efseran (berpirsên leşkerî) nine, belkî eva encama metod û siyaseteke darêtî û bi bername ya rejîma Komara Îslamî li hember gelê Kurd û hemû xelkê Îranê ye. Li midehê gotûbêjên di navbera Îranê û Yekîtiya Ewropayê de rewşa mafê mirovan ber bi başiyê neçûye û Komara Îslamî ya Îranê ji van gotûbêjan bi merema bihorandina demê û derbasbûn di bin givaşên navneteweyî de mifah jê wergirtiye, çimku dîtina rewşa mafê mirovan li Îranê bi terzeke piratîkî ne pêkan e û ji vê demê ve, rejîma Îranê rê nade tu çavdêreke navneteweyî ku serdana Kurdistanê bike. Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê daxwazê ji Neteweyên Yekbûyî dike ku tund û tûjiya berdewam li dijî gelê Kurd mehkûm bikin.

Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê daxwaz ji endamên Parlemana Ewropayê dike bala xwe bidin ser rewşa mafê mirovan di Kurdistana Îranê û êrîşên leşkerî, siyasî û aborî yên berdewam li dijî xelkê Kurdistana Îranê şermezar bikin.

Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê
Pêwendiyên Dereve

Daxuyaniya Çapemeniyê
Bi Derewxistin

PDK Îranê pêwîst bi veşartina tu "peymanek"ê ji xelkê Kurdistana Îranê nabîne

Malpera "Bo Rojhelat", di nûçeyeke şaş û dijminkarane de ku di roja 29.10.2006'an de hate weşandin, îdeaya vê çendê dike ku PDK Îranê tevî "Seltenet Teleban" (Partiyên Alîgir ên sîstema Şahenşahî) **peymaneke nepenî** girê daye. PDK Îranê cuda ji Kongireya Neteweyên Îrana Federal ji bo pêşeroja Îranê tevî tu partî û aliyeke Îranî lihevhatin îmza nekiriye û bi vî awayî bi nav "eşkerekirina" malpera "Bo Rojhelat" ku yê bûye kanalake propagandayê li dijî PDK Îranê û hevrefiya partiya me, bi derew tê derxistin.

Siyaseta ron û aşkera ya PDK Îranê di pêxema xebat ji bo bidestveanîna mafên neteweyî yên gelê Kurd di çarçoveya Îraneke demokratîk ya federalî de ji bo xelkê Kurdistanê ne veşartî ye û di vê derheqê de partiya me pêwîst bi veşartina tu **Peymanekê** li çavkaniya hêz û şiyana xwe ku xelkê Kurdistanê ye, nabîne.

Partiya Demokrat ya Kurdistana Îranê
Bîroya Derveyî Welat
30.10.2006 - Parîs

www.aftabkurd.org

Rî Jî Dêndar Dibin

Mihemed Hemo

Bê guman, gava mirov bazirganiyê bi riyên xwe bike, rojekê wê riyên xwe dêndar bike.

Carcar kurd dibêjin her hevdeyek rî Îblîsek pêve ye!

Gava welatê Lîbiya, di şerê sar de, bazar xwe wek hemû welatên sosyalîst vekir, ji ber wê bazirganên; her welatî berê xwe dan welatê Lîbiya. Wê hingê; ez bi xwe li wî welatî bûm, ez jî ketim nav bazirganiyê, her deh panzdeh rojan, ez ji bajarê Ziwara carekê diçûm, bazara reş li bajarê Terblisê.

Her ku ez diçûm wê bazarê, min serdana dukanên hemû kurmacan dikir, li hal û demê wan dipirsîm.

Serekê bazirganên kurd jî Mihemedê Fatê bû, ji devera me ya Efrînê bû , çi carê ez biçûma Terblisê, divê min serdana wî bikira, eger ne li bazarê ba, li malê bû. Rojekê ez çûm dikana Mihemdê Fatê, du kurên wî li wir bûn, lê ew li wir nebû.

Gava ez lê pirsîm, ji min re gotin; li dev Hec Elî ye, hinekî li cem wan mam, bavê wan nehat, ez rabûm, min gerek li bazarê kir û carek din vegeriyam dikana wan. Min dît hîn bavê wan venegeriye dukana xwe , min di dilê xwe de got: Xudê xêr ke! Ticarî Mihemedê Fatê dukana xwe wisa bi ser kurên xwe de bernedayî û neçûye cem kesî li vê bazarê?.

Kî ye ev Hecî ?! Ez zanim Mihemedê Fatê ji siya serê heciyan hez nake, wele ez hîn di wê xemê dabûm, min dît ew î ji wê de tê, gihîşt dukanê, yekser ji min re got: Mamoste Hecîyekî ketiye vê bazara me, ta tu dibêjî; mirovekî qenc û hêjaye, Xudê û pêxember jê razî be, ez diçim li dev wî bêhna xwe vedidim.

Min got: Heciyê te Kurd e, Ereb e ??

Got: Na wele, Ereb e, lê merovekî ta tu bêjî pak e û bi ser dînê xwe de mitih e .

Bira tu bi heciyên Kurd bawer nakî, te çawa bi vê Heciyê Ereb; bawariya xwe aniye ??

Bira ev ne îşê Heciyan e! Nûr ji rûyên wî dibare. Ma te diye min ticarî guh daye vir û fîtên Mela û Heciyan? Lê ez zanim ev mirova, mirovekî pak e bi wa hemêza riyên xwe yî sipî ve hatiye li walatê biyanî kar dike, ji wê diyare ku mirovekî pak e, bi rastî ez bi xwe ji Ereban hez nakim, lê mileteke, me gotî û negotî mirovên pak jî tê de hene .

Piştî çend rojan; ez dîsa hatim wê bazarê, min riya xwe bi dikana Mihemedê Fatê xist, dîsa ji min ra gotin: Çûye dev Hec Elî.

Ji ber min xwest wê Heciyî binasim, ez çûm dikana Hecî, min dît komek bazirganên wê bazarê li dikana wî rûniştine, Hec Elî di nîvê wan de rûniştî fîteyek sipî li serê xwe alandî, cotek tizbî yê dirêjî bi dest de ye, selewatan li dû selewatan dikişîne, kirasekî sipî ta ber ûzka li bere, rî jî ta ser navkê berdane sûnd bixwe yek hevdeya reş jî tê de nayê xuyan, rengê fîtê, kirês û riyan bûye yek, çi kesê ji wê de tê, xwe qorî destên wî dike û maç dike, yên pereyên xwe li dev dîdinan kîbûn, yên çayê jê re dihanîn kîbûn, yên kêşe û arêşeyên xwe yî mal jê re digotin kî bûn ?

Hecî di nav xwe de wek pêxemberekî lele dikirin.

Piştî demekê me kir ku em biçin, Mihemedê Fatê cû destên wî ramûsan û xatir xwest, em ji cem Hecî bi derketin.

Mihemedê Fatê zanî ku ez ji kiryarên wî behnteng bûm, wî ykser got: Mamoste Mihemed ez bawer nakim ku merov wek vî Heciyî di dinê de hebin, Hema ez kanim bêjim ev pêxember e.

Min got: Pêxemberê we pîroz be li we.

Ew hala berdewam bû, îdî di wê bazarê de, kesî bi xudê sûnd nedixwer, tenê bi serê Hec Elî sûnd dixwerin.

Di demsala havînê de ji ber germê bazirganan zû dikanên xwe digirtin diçûn mal.

Mihemedê Fatê li Terblusê li ser deryayê xaniyekî torîzmê kirê kiribû havîn, zivistanê tê de bû.

Rojekê Piştî nîvro, ez çûm serdan Mihemedê Fatê, min dît xwerina xwe amade dike, min çentê xwe dîna dev wî û min xwe berda ava deryayê, qerbelqiyek mezin di avê de hebû, di nav wê xelkî de, min melevanî dikir, min dît tiştekî balkêş heye, ew xelka sêrî dike, gava ez ber vê çûm, min dît merovekî navsalî li gel keçkek dazdeh, sêzdeh salî ye, Carna keçkê li bişta xwe dike, carna dixe hemêza xwe, carna keçik di orta wê xelkî de, di destê wî de diqêriya, piştî derketin keviyê min bala xwe dayê, min keçik nasî ku ew keça Mamosteyekî Lubnanî bû, wî jina xwe berda bû, ew keça xwe bi tenê bi hev re dijîn, car-cara; ew mamosta dihat nav me Sûriyan, ew keça xwe jî bi xwe re dihanî, Lê ew mêrê vê re bû, min bala xwe didayê wek ku min ew mêre dîtiye, lê nedihat bîra min ew kî ye, serî ji min bû û nehat bîra min ku min ew mirova kî ye û min li kuderê diye.

Ta wê hingê min nêrî Mihemedê Fatê li keviya avê dest di min de, radike û dibêje were xwerin amedey e.

Ez ji avê derketim, lê her hişê min li dev wî mirovî ma ku bizanibim, ew mirov kî ye û min li ku dîye, nedihat bîra min!

Gava em li ser sifrê rûniştin, hat bîra min ku rûyê wî mirovî li Hec Elî diçû .

Min ji Mihemedê Fatê pirsî: Hin birayên Hec Elî li vê bajarî hene?

Got : Min nebihîstî ku birayên wî li vir hene.

- Bawerke min niha mirovek bi keça wî mamosteyê Libnanî re dît, hema rî pêvabana min ê bigota ew Hec Elî ye, loma ez dibêm qey birayê wî ye.
-

Min dît Mihemedê Fatê histû bada û got: Ew nibirayê wî ye, ew Teresa bixwe ye, ew mamosteya çûye bajarê Benîxazî, keça xwe li mala hêştî, we dizanî ku mala Hec Elî mala baweriyê ye, wê teresê Hecî jî riyên xwe dateraştine û aqil bi keçkê re winda kirî, çinkê diho jî ji min re gotin; Hec Elî li gel wê keçikê

li vir e.

Bawer bike ! Mamoste ji diho de xew nehatiye çavên min ji ber vê bûyerê !...

Piştî derve hênik bû, ez û Mihemedê Fatê bi hev re derketin hotêla Derya sipî, Em ketin deriyê hotêlê, me dît Hec Elî jî ji hotêle tê der, em di derî de rastî hev hatin, Mihemedê Fatê di deriyê wî de ma û her li wî nihêrî, awir berdanê. Hec Elî got :(Işbek)çi bi te hatî ?

Mihemedê Fatê: dest avê çengê got: Ka nîne?

Hec Elî : (ilek Heq eleyî şî) Mafekî te li min heye ?

Mihemedê Fatê: Belê mafê min li te heye û pire jî ez te ji vir bernadim, ta tu heqê min nede, niha ji te dixwazim, xelkê li hola hotêlê bûn, hemû rabûn hatin sera wan, pirsîn; çi bûye-çi heye?

Mihemedê Fatê bi yaqa Hec Elî girtibû vedigijgijan digot; Vî bênamûsa heqê min xweriye.

Heçî di destê Mihemedê Fatê de perîşan bûbû, di got: Bira ka heqê çiye bêje; min malê te rakirî, min pere ji te dên kirine, ji min re bêje ta ku ez bizanibim?

Mihemed: Mal çiye, pere çine??

Ey bê namûs! Tu nizanî heqê min çiye?

Hawar-hawara Hec Elî bû di destê Mihemed ê Fatê de, li devê wê Hotêla mezin, di got; xelkino ji bo Xudê werin, ev dewa çî li min dike.

Ew xelkê hotêlê hemû civîn ku bi karibin Hecî ji destê Mihemedê Fatê bi derînin nikanîn. Mihemedê Fatê; her daxwaza mafê xwe ji Hecî dikir.

Hin xizmên Hecî di wir re bi derketin, dîn ku Hecî di siqîfekî teng de ye, ji Mihemed re gotin: Bira were Mafê te çiye? Bi ser seran û çavan li pêş vê xelkî hemû bi soz û peyman, em heqê te didin, bes ji me re xuyabike ku heqê te çî ye?.

Mihemed got: Bira kes nikare heqê min bide, ji vê bênamûsî derbas be! Heqê min di riyên vê bê şerefî da ye, ez riyên wî yên derewîn dixwazim!

Bira çi heqê te diriyên wî de ye! Wî rî jî nehiştin tu dewa çî dikî?

Birano ! nêzîkî salek e ez rêz û hurmetê ji vî kafirî re dikim, ji ber riyên wî, îro jî ez wî dibînim, bê rî ye . Ew cefa yê min, li kuderê ma? Ez daxwaza heqê wê cefayê xwe dikim, ew heqê min jî qet nayê dandin, tenê di vê riyên xwe ji min re bîne, ta ku bi qaserî min ji riyên wî re harmet girtî, bi qaserî wê jî bi ser riyên wî de bimîzim, ta heqê min bê Meydanê.

.

www.arsivakurd.org

AZADIYA MIROV



ADAR JIYAN
adarjiyan@mynet.com

Tu ji kîjan mirovî/ê dipirsî bipirse, dikare bi hêsanî behsa girîngiya mafdarî û dadmendiyê bike û mafê azadî û serxwebûna mirov bêşik û bêdeman biparêze. Belê tenê behskirin, vegotin û parastin têra bidestxistina azadiyê nake.

Her mirovê/a hişmend û aqildar ku xwediyê hest û hizrên azadîparêz e, her tiştî li gorî bîrdoza xwe rave û şirove dike. Bi vê jî nayê ser, her tiştî li gorî dane û nêzîktêdayînên xwe yên civakî disenifîne. Tu kes ranabe, nabêje, "dîlîtî û koletî tiştekî baş e". An jî "hewcedariya mirov bi azadiyê nîn e." Na. Jixwe ev tişt werin gotin jî zêde tu rêz û hêzê nabînin û ji hêla mirovan ve qet nayên pejirandin. Çimkî hemû daxwaz û pêdiviyên mirov li ser nîgaş û pêşnûmayên erînî, hatine/têne rikinandin. Tu mirov, di axaftin û vegotinên xwe de tiştên neqenc, bêrê û beradayî pêşkêşî mirovahiyê nake. Ango tu kes naxwaze dilê mirovan ji xwe bihêle û wan ber bi nexweşî û reşbîniyên jiyanê ve bidehifîne. Qene pêşî bi zimanê xwe, wan li xwe vedihewîne û peyre jî wan diezimîne ser sifreya qinyat û xweşbîniyê. Belê gava ku liv û dev (gotin û kirin) li hevdû dernakevin, qinyat û xweşbîniyên beravêtî li inyad û reşbîniyên jiyanê yên rastîn dadigerin. Wê çaxê bawerî û ewledariya mirov jî bi rû de diçin.

Wateya peyva azadiyê ji hêla ferhengî ve teng û misoger; belê ji hêla têgînî ve guherbar û berfireh e. Lewre azadî, him li gorî fikr û ramana mirov, him li gorî hest û derûniya mirov û him jî li gorî şert û mercên jiyana mirov diguhere. Her çendî ku wateya azadiyê ya ferhengî bi dusê hevokan hatibe sînordarkirin jî, rastiya wê ya têgihî, bi qasî ku di tu mêjiyan de nesitir e û nedebir e, kûr û bibergeh e. Ji ber ku azadiya mirov, ji hêla wî/wê ve nehatiye tayînkirin, çendî ku ew li gorî hest û hizra xwe, li gorî şert û mercên xwe rave bike jî dê kêm û nuqsan bimîne. Ango, azadî her gav ne qad û warekî arizî û xwesr e. Qadeke hevpar û giştî ye û tevê mirovahiyê eleqedar dike. Çawa ku mirov, wekî takekesekî/ê bi serê xwe nikaribe bêyî civaka xwe serbixwe û azad bijî, civaka wî/wê jî bêyî mirovahiyê nikare azad û serbixwe be. Ji bo wê, azadiya her mirovî/ê rasterê girêdayî azadiya civaka wî/wê û her wiha azadî û serxwebûna her civakê jî girêdayî azadiya tevê mirovahiyê ye.

Li gorî hin pîvang û formulasyonên zanistî, mirov bi hêsanî dikare bibêje ku tu mirovên azad û serbixwe nîn in. Belê tenê hin kesên ku hest û hizrên wan, wan ber bi têkoşîn û hewldanên azadiyê ve dikin û wan arasteyî têkoşîna azadî û serxwebûna mirovahiyê dikin, hene. Ew jî, gelek caran di asta hêvî û daxwazê de diesire û derbasî kardariya jiyanê nabe. Heta ku dibe jî bi gelek astengî û arîşeyên civakî re rû bi rû dimîne.

Bêşik, qest û armanca me, ne ew e ku em di vê nivîsara xwe de, reşbînî û bêhêvîtiyê belav bikin û bibêjin têkoşîna azadî û serxwebûnê tu car nagihîje armanca xwe. Na. Berevajî wê, ji ber ku em dixwazin girîngiya wê deprêş bikin û bi tevayî lê xwedî derbikevin, vê rastiyê dibêjin. Gelo îro kîjan mirovê/a cîhanê dikare xwe wekî kesekî/e azad û serbixwe bide peyitandin? Carekê ev yek ne pêkan e. Ji lewre ew kesên ku xwe wekî serwer û desthilatdar nîşan didin jî tê de hemû kom û komuşkên civakî pêşî xwe dispêrin hin kes û hêzên din û parsa azadiya xwe dikin.

Kesên azad û serbixwe ew in ku pêşî di dil û mêjiyê xwe de azadî pêk anîbin û peyre li hemberî kes û hêzên desthilatdar serê xwe netewandibin, in. Takekes dibe, civak dibe, yên ku li hember hemû kelem û astengiyan radiwestin, li dijî zagon û qedexeyên fermî derdikevin û her gav li nik gel û civakên herî bindest û bintûte cih digirin û têkoşîna azadiyê dikin, in.

Îcar gelo çima tu kes nikare bi tena serê xwe azad bibe? Ji ber ku azadî nirx û hêjahiyeke hevpar a tevê mirovahiyê ye. Û ji ber ku mirov bi taybetî li azadiya xwe û bi giştî jî li azadiya tevê mirovahoyî xwedî dernakeve an jî wê parçe parçe dixwaze, nikare ne azadiya xwe ya arizî û ne jî azadiya mirovahiyê ya gelemperî bi dest bixe. Ji ber ku azadiya kesane rasterê girêdayî azadiya mirovahiyê ya gerdûnî ye. Her wiha azadiya mirovahiyê ya giştî û gerdûnî teqez dê bi destê kesên azadîxwaz û têkoşer bi dest bikeve. Azadî nirxekî wisa giranbuha ye û tevê mirovahiyê têkildar dike. Belê ew jî rasterê bi destxistina dad û mafê mirov ên rastîn û rewa ve girêdayî ye.

Bi kurtayî, heta ku mirovahî azadiya xwe ya giştî bi dest nexe, tu civak; û heta ku civak jî azadiya xwe bidest nexe tu takekeks nikare wekî mirovekî/e azad û serbixwe bijî. Çimkî azadî çêlika dadmendiyê ye. Wekî ku Joseph Joubert jî dibêje:

"Heke dadmendî hebe, dê azadî jî hebe"

Kaniya Helbestan

Letîf Epozdemir

PÊŞEWAZÎ

bende û dîlê zeman im
bijang wek tîr ebrû kewan
kezya berde ku bi reqsin
bisk û gulî bên himatê.

Şûr bi dest dijwar bi hestî
Bihara min neke zivistan
Dilovanî bê mirin e
Xwe dûr neke ji sebatê

Her carek ku sing diheje
Zelzele dikeve nav dil
Bi dîdarek sermest dibim
Derkeve nava civatê.

Ji hezaran dert re heye
Kûl û şehînek bo sebeb
Kirasê agir li me ye
Lewra dil nake tebatê.

Agirê zerdeşt bi nav im
Di şewite cerg û dil
Şev û rojan xew betal e
Na weste qet ji lebatê.

Meke gazin ey dîlbera gerden bi xal
Fesal tune nîne mecal
Wê bihar bê vebin kulîlk
Herkes kubar bi felatê.

NEWE BÎRA MİN

Êdî bes e bêzar im
Navêm newe bîra min
Nekeve xewa min ê evdal
Cot digerin li beheştê
Hûr û periyên şepal.

Eger nebim pûtperest
Bi wan re dibim heval
Ji hisreta jar ketim
Bûm nîvmirî sala îsal
Dermanê dûriyê çiye
Niha nayê bîra min
Mêrkujê evînê dîsa
Rakirin fermana min.

Evîna te ye li serê min mîna tac
Ez ne xaçperest im û
Nîne li ser singa xaç
Bendeyê evînê me
Sermest û kerr û gêj im
Cîhan hewceyê min e
Ez jî bi te ve mihtac
Te bi ser dilê min ve
Kulê reşand
Dîsan jî li te borîm
û min te bexişand.

www.arsivakurd.org

Lidarxstina Şevbêrka Fîlmên Kurdî Li Fînlandê

Mecîd Heqî, Helsîkî - Fînland: Bi nîşandayîna sê Fîlmên dukomanterî, Şevbêrka Fîlmên Kurdî li Başûrê Rojhilatê Fînlandayê hate lidarxstin. Komeleya Aştî ya Fînlandê û Komeleya Aştî bo Kurdistanê roja pêncşem, 26.10.2006'an, Evariyeke Fîlmên Kurdî li herêma Başûrê Rojhilatê Fînlandê lidar xist ku ji aliyê hejmarek ji xelkê Fînlandayê û Kurdên akincî yên vê deverê pêşwazî jê hat kirin. Êvariya Fîlmên Kurdî ku li binkeya Yekîtiya Sendîkayên Fînlandayê di bajarê Îmatrayê de birêve çû, di destpêkê de bi basekê li ser rewşa Kurdistanê û xebata siyasî ya neteweya Kurd ji aliyê Mecîd Heqî, berpirsiyarê kar û barên navneteweyî yê Komeleya Aştî bo Kurdistanê hate vekirin, li peyre fîlmên: **Pirsa Kurd li Turkiya ber deriyê Ewropayê** - deranîna Jiyar Gul, Kanada 2005, **Mehdî Zana- Berxwedan jiyan e** - deranîna Qudret Guneş, Fransa 2004 û Fîlma **Werzişa jinên Kurdistanê**, deranîna Karolîna Podesta, Birîtaniya 2005 hatin nimayîşkirin.

Êvariya Fîlmên Kurdî doma "**Festîvala Kurdistanê**" ye ku ji aliyê Komeleya Aştî ya Fînlandê û Komeleya Aştî bo Kurdistanê li bihara sala 2006'an ve dest pê bûye û qirar e li bajarên cur bi cur ên Fînlandayê de werin nimayîşkirin.

Di Romannivîsiya Kurdî De Hilmeke Nû: SÊ TERÎŞ

Romana Kurdî û nû ya **SÊ TERÎŞ** ji aliyê **Serkan Birûsk** ve hatiye nivîsandin. Eva romana wî ya yekem e. Çapa sala 2006'an ya bajarê Stokholm a Swêdê ye: 213 rûpel e.

Pirtûk li çapxaneya Apecê hatiye çapkirin.

Em weke Desteya Weşana Agirî bona çapbûna yekem romana nivîskar Serkan Birûsk pîrozbahiyê ji wî dikin û herwiha em hêvî dikin ku ew li ser vê xebata xwe ya pîroz berdewam be û di pêşerojê de bi berhemên baştir wêjeya Kurdî zengîntir dike.

'Diyarname'

Rojnameya Aso Dibe Rojane

Rojnameya Aso ku weşaneke serbixwe ye û ji aliyê dezgeha "Xandan" ve tê weşandin, di malpera xwe de daxuyaniyek weşandiye û tê de dide zanîn, di demeke nêzîk de Rojnameya Aso dê bibe rojane.

Aso di dema borî de sê caran di heftiyê de dihat weşandin. Weşandina

ASO

Rojnameya Aso bi awayekî rojane jî dê gaveke mezin û dîrokî di rojnamegeriya Kurdî bihê hesibandin.

Romana Bilîcan Ya Perwîz Cîhanî Li Duhukê Hate Çapkirin

Bi pênûsa nivîskarê Kurd, Perwîz Cîhanî, romana Bilîcanê li sala 2002'an li weşanxaneya Doz li Stenbolê de hatiye weşandin. Ev romana mehekê berî niha careke din bi rastnivîsa Kurdî – Erebî ji aliyê Yekîtiya Nivîskarên Kurd tayê Duhokê li Kurdistana azad li çapxaneya Hawar da hatiye weşandin.

Bilîcan ji 463 rûperên mezin pêk tê.

Ji bo bersîvdana Xaçepirsa hejmaran (Sudoku)yê ya nû, tenê van sê xalên jêrîn berçav bigirin:

1. Hejmarên 1-9'ê di xet(xêz) û stûna serjêr de tenê carekê dubare dibe.
2. Hejmarên 1-9'ê di xet(xêz) û stûna çeprast de tenê carekê dubare dibe.
3. Hejmarên 1-9'ê di nava çargoşeke 3×3 de tenê carekê dubare dibe.

Bersiva Sudoku a Hejmara 48'an

7	4	1	5	2	9	3	6	8
9	3	2	1	6	8	4	5	7
5	6	8	3	7	4	2	1	9
2	9	6	7	3	5	8	4	1
4	1	3	8	9	6	5	7	2
8	5	7	2	4	1	6	9	3
6	8	4	9	1	3	7	2	5
3	7	9	6	5	2	1	8	4
1	2	5	4	8	7	9	3	6

Xaçepirsa Hejmaran (Sudoku)

5			1	8		2		3
	3		6		5		1	
		8			3	6	5	
6	1					5	9	8
3					6	4	7	
	5	4		9	8	1	3	6
7		3	8	6	1			
	2	1	9	5	7		6	
9			3		4			1

www.arsivakurd.org

agiri

Rojnameya panzdehrojî ya siyasî, çandî û gîştî
Partiya Demokrat ya Kurdistana Îranê diweşîne

http://www.kurdistanmedia.com/kurmanci/kurmanci. php

Navnîşana derveyî welat: AFK B.P. 102- 75623 Paris CEDEX 13 –FRANCE
E - Mail:
agiri2003@hotmail.com
agiri2003@googlemail.com

Keça Seyîd Riza, Li Gora Bavê Xwe Digere

Keça **Seyîd Riza**, **Leyla Polat**, ji bo ku ciyê gora bavê xwe bizanibe, li Elezîzê serî li wîlayetê da. Polat di serlêdana xwe de bi rayedarên dewleta Tirk re da zanîn ku li gor qanûna nîzamnameya goristanan, mafê wê heye ku ciyê gora bavê xwe bizane.

Tê ragihandin ku, Polat bi alîkariya parêzerê xwe, **Huseyn Aygun,** serî li wîlayeta Elezîzê daye û daxwaza wê ew e ku cenazeyê bavê xwe bibe gundê xwe û jê re gorekê bide çêkirin.

Li gor agahiyên ku Polat derbarê ciyê gora bavê xwe de bidest xistine, piştî darvekirinê, meytê Seyîd Riza, li Elezîzê li derdora gundê "Holfenk"ê, li devera bi navê "**Kîreçocagi**" hatiye binaxkirin. Her wiha li gor agahiyeke din, tê gotin ku li nêzîk îstasyona Elezîzê li herêma "**Yolçatî**"yê hatiye veşartin.

Parêzer Aygun, da zanîn ku ciyê gora Seyîd Riza, di belgenameyên dozgerî û midûriyeta goristana Elezîzê de heye.

Nemir Seîd Reza Dêrsim

Aygun, ji wîlayetê daxwaz kir ku fermanekê bide dozgerî û midûrîyeta goristanê, da ku meytê Seyîd Riza teslîmî wan bê kirin.

Weke tê zanîn serokê serhildana Dêrsimê, Seyîd Riza, di 18'ê Çiriya paşîn a 1937'an de, li Elezîzê di bin şertên awarte de hatibû îdamkirin û ciyê gora wî hê jî nehatiye eşkerekirin.

Çavkanî: Net Kurd

6 Weşan Li Zanîngeha Urmiyê Hatin Daxistin

Zanîngeha Urmiyê, 6 weşanên xwendekarî nemaze 3 weşanên Kurdî – Farsî ên vê zanîngehê qedexe kirin. Werznameya **"Manîşêt"**, xwediyê wê Navenda Ronahî û biberpirsiyariya Husên Hesenzade û bi Sernivîskariya Dilêr Xwedayarî ye. Gavnameya **"Henaran"** bi xwedî û berpirsiyariya Qanih Mihemedî û Sernivîskariya Mihemed Resûlzade û Ebdulrehman Xizrî û werznameya **"Tirîfe"**, xwediyê wê Navenda Ronahî û Berpirsiyariya Cehanbexş Pûrxizir û Sernivîskariya Yeqûb Rewa, bi sûç û buxtana anîne rojeva pirsên netewî, belavkirina fikr û ramanên Çep, jarkirina Hikûmeta Îslamî û kiryar li dijî tenahiya neteweyî hatin qedexekirin. Her wiha 3 weşanên Azerî – Farsî bi navên "Oyanîş", "Yaşil" û "Kêşawerzanê Cewan" (Cotkarên Ciwan) bi buxtan û tawanên şibê

yên din hatin qedexekirin. Hêjayî gotinê ye ku weşanên Kurdî – Farsî yên **Zîlan** û **Roja Nû** jî berê ji aliyê zanîngeha Urmiyê ve, hatibûn qedexekirin.

Çavkanî: Nûçegihanên "RMMK"ê

Hejmara Yekemîn Ya Kovara "Bîrî Xwêndkar" Derket

Yekemîn hejmara Kovara "Bîrî Xwêndkar"(Bîra Xwendekar) ya Yekîtiya Xwendekarên Demokrat ya Kurdistana Îranê ku kovareke rewşenbîrî ye hate çap û belavkirin.

Hejmara yekemîn a kovarê taybet bi demsala havîna îsal bû ku ji 135 rûpelan pêk tê. Mijarên ku di naveroka hejmara 1'ê de cih girtine, civakî, hizr û raman, dîrok, çand û huner in. Dosyeya vê hejmarê li ser mijara **Şoreşa Çandî** di Îranê de ye ku çend gotar û lêkolîn di vê derheqê de hatine weşandin. Babeta dawî ya kovarê jî li ser federalîzmê ye.

ji aliyê Desteya Weşana Agirî ve, em pîrozbahî û destxweşiyê ji Desteya Weşana Kovara "Bîrî Xwêndkar" dikin. Hêviya me serkevtin û berdewambûna wan di xebatê de ye.

Ji bo bidestxistina vê kovarê serdana malpera jêr bikin.

www.yxdk-kurdistan.com

Lîsteya Azadiya Çapemeniyê Ya Cîhanê Hat Weşandin

Rewşa Çapemeniyê Di Îran, Sûriye, Îraq Û Turkiyê De Dijwar E

Rêxistina Nûçegihanên Bêsînor ya Navneteweyî, lîsteya rewşa azadiya çapemeniyê di seranserî cîhanê de weşand. Bi gîştî di vê lîsteyê de rewşa azadiya çapemeniyê li 168 welatên cîhanê li pey niraxndinê hatiye nîşandan. Welatên Îran (162), Sûriyê(153), Îraq(154) û Turkiye(100) di vê lîsteyê de di dawiya piraniya welatên cîhanê de ne. Kureya Bakûr di warê azadiya çapemeniyê di rêza herî dawî (168) de cî girityе û piştre welatên Turkmenistan (167) û Erître (166) di lîsteya han cih girtine. Berevajî van welatane, azadiya çapemeniyê li Fînlandayê herî xurt e, yanî yekem e. Welatên Îsland, Îrland û Holanda di rêza 2 heya 4'an de ne.

Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê di lîsteya azadiya çapemeniyê ya sala 2006'an a Rêxistina Nûçegihanên Bêsînor di rêza 53'ê de cî girtiye.

Serhejmariya Nifûsa Îranê Dest Pê Bû

Şeşemîn gera serhejmariya nifûs di Îranê de roja şemî, 06.08.1385(28.10.2006)'an, dest pê kir.

Serhejamriya han li sala 1335'an ya Rojî (1956) şûn de, di navbera her 10 salan carekê li Îranê de birêve diçe.

Di kar û barên têkildar bi vê serhejmariyê de nêzîkê 19 hezar kes beşdar in û xebata wan dê midehê 20 rojan dom bike. Xerca serhejmariyê 40 milyon Dolar hatiye texmînkirin û encamên sereke yên wê di meha Kanûna Pêşîn a îsal de, dê bihên eşkerekirin.

Hêjayî gotinê ye ku nifûsa Îranê niha 70 milyon kes û du hidî nifûs li dema serhildana gelên Îranê di sala 1979'an de ye ku piştî hatine ser kar a Mehmûd Ehmedînejad, piştevanî li jordeçûna nifûs tê kirin û texmîn tê kirin ku bi zûyî nifûs dikare li Îranê de heta 120 milyon kesan jorde here.

Çavkanî: "bbcpersian.com"

www.agiri.org